

Dirbêsiyê... soza mayinê, hêviya pêşerojê



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٢٢) ٢٠١٥/٧/١

kulmek ax û
mistek genim... ji
xaka **Welat**ê me



PEYVA WELAT



Gelo çanda kurdî bi xêr e

Aras Yûsiv

2

Ji mafê mirov e ku piştî her karekî bike li paş xwe binere û nas bike ka wî çi kir, gelo encamên wî danîbûn ber çavên xwe ji wî karî hatin serî an na?, û eger wî her tişt bi ser nexist gelo çi qas rêjeya wan tiştên bi ser ketin ?

Li vir em jî dikarin bipirsin bê piştî bêtirî 4 salan li ser destpêka şoreşa sûrî ka çi rewşa çanda kurdî ye? gelo ew baş e an na?, û eger ne baş be çi tê xwestin bo baş bibe û eger ji xwe baş bûbe çi tê xwestin bo bêtir baş bibe.

Raste hejmarek mezin ji rojname û kovaran derketine lê li aliyê din divê em nas bikin ka çi qas ji wan berdeham kirine û yê ku berdeham dikin ka rewşa wan çi ye?, belkî ku ev yek were kirin em ê karîbin nema ber bi paş de vegehin û herdem riya xwe ber bi pêş ve bigirin.

Ev kovar û rojnameyên ku berpîrsên wan li ser weşandina wan berdeham in ji bilî yê ku rawestiyane, tekez zehmetî li pêşiya wan hene û eger em wan zehmetiyên rakin ew ê dîsan nekevin ew rewşa rojnameyên ku weşana wan sekiniye.

Em ê ta radeyeke mezin rast bin dema ku em bêjin sedemên aborî yê herî mezin in ku li pêşiya berdehambûna kovar û rojnameyan sekinîne, belkî careke din heman sedemên ku berî bi dehan sal li pêşiya çanda kurdî sekinînin ku li pêş bikeve dîsan dúbare dibin.

Lê gelo derfet heye ku ev rewş were derbas kirin?

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane



Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Xweşnav Heso
Mihemed Zekî Mihemed

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Şert û mercên ku şer û pêşketinên leşkerî li ser rojavayê kurdistanê ferz dikin , roleke wan ya mezin di vê rewşê de heye, ew bi xwe ne yê carinan dibin sedem ku kaxez hebin an tunebin bo çapkirinê an jî ku ta elektrîkê bi xwe hebe an tunebe.

Ev pêşketinên ku li derdora tevahiya van herêmên kurdî derbas dibin nahêlin ku aramiyeke aborî çêbibe ya ku ew ê karîbe çanda kurdî li vî parçeyê ji kurdistanê têxe rewşeke baştir de.

Ev çand îro bi hewceyî piştigiriyeke mezine wek ya ku her dewlet dide çanda xwe û eger ne wisa be zehmete ku em bêjin rewşa çanda kurdî bi xêr e, û hêvî gelek in û pir in ku dema ev şer li Sûriyê raweste êdî asoyên xweştir û geştir li pêşiya zimanê kurdî bin.



Xweşnav Heso

Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr .

		9			4	
		6	3	4		2
2		4	5		9	7
	6	7			3	
	4			3		9
	2		9		6	
		2			1	4
	9	3	8		5	1
7			9			5

Bersiva jimara bûrî

1	4	5	3	2	7	6	9	8
8	3	9	6	5	4	1	2	7
6	7	2	9	1	8	5	4	3
4	9	6	1	8	5	3	7	2
2	1	8	4	7	3	9	5	6
7	5	3	2	9	6	4	8	1
3	6	7	5	4	2	8	1	9
9	8	4	7	6	1	2	3	5
5	2	1	8	3	9	7	6	4

Bersiva jimara bûrî

1	s	e	y	d	a		a
2	î	r	a	n		ş	e
3	p	ê	r	a	r		s
4	a	k	a	d	î	m	î
5	n	i			h	o	î
6	r	û	b	a	r		l
7	x		r	o	n	î	d
8	a	s	a	n		k	o

PEYVA WENDAYÎ

(kêfa min – ji te re tê – difirim – gava tu tê – roja ku – te ne – bînim – wê ci bi – halê – min – bê – kêfa – min – ji te – re tê)

k	ê	f	a	m	i	n	h	d
ê	t	b	î	n	i	m	e	i
t	e	k	ê	f	a	w	u	f
e	n	j	i	t	e	ê	k	i
r	e	r	e	t	ê	c	a	r
e	n	s	e	k	ê	i	j	i
t	i	m	i	n	b	b	o	m
i	m	ê	l	a	h	i	r	ê
j	ê	t	u	t	a	v	a	g

Peyva wendayî ji 6 tîpa pêktê,nave bajarekî Kurdî ye .

Bersiva jimara bûrî : Girkêlegê

XAÇERÊZ

Asoyî :

- 1-dera nizm ji deştê(b) .
- 2-agir – tiştê ku bi sarbûnê tê naskirin.
- 3-bo pîrsê – du tîp ji peyva Ajo – tersê dereng.
- 4-derbasî hundir bibe 'bi zimanê Turkî'.
- 5-tersê nekin.
- 6-cih (b) .
- 7-tersê jin – tersê ronî .
- 8-got,qise kir – du tîp wek hev in.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2								
3								
4								
5								
6								
7								
8								


Serjêr

- 1-peytexta Kurdîstana Sor – ap .
- 2-bo pîrsê ye (b) – tişê qenc û baş (b).
- 3- yê ku ji netewa Erebi be (b).
- 4-patoz,hesade (b).
- 5-ji bo pîrsê ye (b) – tu tîp wek hev in.
- 6-keskayî.
- 7-teresê dûr (b)-du tîp wek hev in.
- 8-tersê hatin (b)- tersê ruhn û asan.

PEND Û ŞÎRETÊN KURDÎ

- 1- Bav nig hilanî,kur li şûnê danî !
- 2- Av riya xwe bi xwe dibîne !
- 3- Gurrî ji bûye axa !
- 4- Îro heye,sibe tune ye !
- 5- Kum mezin e,lê serî valaye !
- 6- Qaz bi qaza re,û baz bi baza re !
- 7- Wek berfa ku tu bavêje nava avê !
- 8- Ard dihere,lê kapek dimîne !
- 9- Gotin rehet e,kirin zehmet e !
- 10-Her ewr baranê nabarîne !

23



ما لا تعرفه عن ألبرت أينشتاين

أحمد حسو

3- اتهمه القوميون الاشتراكيون (النازيون) بتأسيس (الفيزياء اليهودية) مما زاد من كراهية الألمان له و خاصة بعد الحرب العالمية الأولى و قبيل الحرب العالمية الثانية مما دفع به بالهرب إلى الولايات المتحدة الأمريكية و من المعلومات التي كانت بحوزته عن القنابل النووية و بمساعدته تمكن علماء أمريكيين من صناعة القنبلة النووية التي قضت تماماً على أحلام (هتلر) و انتهت الحرب العالمية الثانية .

4- صنفه مايكل هارت في المرتبة العاشرة من كتابه (أكثر 100 شخص تأثيراً في البشرية) .

5- بعد تأسيس دولة (إسرائيل) عُرض عليه تولي رئاسة الدولة عام 1952 ولكنه رفض مفضلاً عدم الانخراط في السياسة قائلا: (أنا رجل علم ولست رجل سياسة) كما قدم عرضاً من عدة نقاط للتعايش بين العرب واليهود في دولة فلسطين و من مقولاته عندها : القومية مرض طفولي، و الطبيعة الأصلية لليهودية تتعارض مع فكرة إنشاء دولة يهودية ذات حدود و جيش وسلطة دنيوية .

6- أراد (أينشتاين) أن يُحرق جسده ويتناثر رماده سراً ، وذلك لتجنب قيام معجبيه بجعل قبره مزاراً، لكن عندما توفي في 18 نيسان عام 1955 م قام الطبيب المختص (توماس هارفي) في مشرحة برينستون بنزع 1200 غرام من المادة الرمادية لدماع أينشتاين ثم توارى عن الأنظار إضافة الى نزع عيني أينشتاين و إعطائه لطبيب العيون (هنري آدمز) و هي موجودة في صندوق الودائع الأمنية لمدينة نيويورك حتى الآن .

7- أوصى أينشتاين أن تحفظ مسوداته ومراسلاته في الجامعة العبرية في القدس، وأن تنقل حقوق استخدام اسمه وصورته إلى هذه الجامعة .

ذلك الطفل الذي لم ينطق حتى بلغ عامه الثالث، في سن الخامسة سأل أباه عن القوة العظيمة التي تجعل البوصلة تتجه نحو الشمال دوماً، يعاني من صعوبة في استيعاب المعلومات في المرحلة الابتدائية، يسأل معلمه أسئلة أكبر من مستوى زملائه الطلبة و أحياناً تفوق قدرة معلمه على الإجابة، فمن هو هذا العبقرى الفذ ألبرت أينشتاين؟ وُلد ألبرت في مدينة أولم الألمانية في العام 1879 من أب يهودي الديانة (هيرمان أينشتاين) و أم يهودية (ني بولين كوخ) درس المرحلة الابتدائية في مدينة ميونخ الألمانية و الثانوية في مدينة آروا السويسرية، تخرج من المعهد الاتحادي السويسري للتقنية عام 1900 م و لكن مدرسيه لم يرحسوه للدخول الى الجامعة، فبدأ بدراسة الفيزياء بمفرده و ربما كانت تلك أحد الأسباب الرئيسية في نظرياته التي وضعها كالنسبية الخاصة و العامة، و التي كان يفسرها لمن يلاقي صعوبة في ادراكها على الشكل التالي: ضع يدك على صفيح ساخن لمدة دقيقة وستشعر أنها ساعة ، اجلس مع محبوبتك لمدة ساعة وستشعر أنها دقيقة هذه هي النسبية، و لكن ما هو غير معروف عنه:

1- تأخر في النطق حتى بلغ الثالثة من عمره، إضافة الى ان نطقه كان متردداً حتى سن السابعة، كما قال عنه أحد مدرسيه بأنه لن يصبح أبداً شخص ذا قيمة في المجتمع .

2- لم يحصل على جائزة نوبل بسبب نظريته النسبية، بل حصل عليها عام 1921 على جائزة نوبل في الفيزياء لاكتشافه قانون التأثير الكهروضوئي الذي يشير إلى انبعاث الجسيمات المشحونة كهربائياً (أيونات و إلكترونات) من وإلى المواد التي تمتص الإشعاع الكهرومغناطيسي مثل الضوء، لأن نظريته النسبية استغرقت سنوات حتى أكدت التجارب توافقها مع نتائج الرصد، و لاسيما انحراف الضوء بسبب الأجسام ذات الكتلة الكبيرة كالأجرام السماوية الهائلة .

Têgeha Azadî di nerîna hin ciwanan de.

Parêzer : Elî Ebdullah Kolo

Her kes li ser riwê cîhanê hewildanê dike, Bo azadiya xwe bistîne gava bin dest be û milletên bindest têkoşînê dike û qelenkî buha datîne. Bo vê armanca pîroz û ji bin destî azad bibe, û şew û hawên Kevin yê Ji nirxên mirov kêmkirî dikin, wek nimûne astengiyên li pêşiya jinan bo berdewamiya xwendinê û qedexkirina wê ku nerîna xwe bide di jiyana xwe de (zewc) û xort jî ji van astengiyên ne dîr in, gava malbat berê wî dide beşekî ji zanîngehê dîrî daxwaza wî, demek pir asteng hene di pêşketina ciwanan disekinînin . Lê tiştê ku cîhan tede derbas dibe pêşketina di her warî de û bi taybetî di warê tîknolocî de tevliheviyek mezin li cem pir ciwanan çêkir, ev ciwan nema azadî û pir tiştên şaş Ji hev dertînin yê ku wan dibin newalên şaşiyê û malbat roleke wê ya pir mezin heye di danasîna têgehaha Azadiyê ji van ciwanan re.

Ji ber vê yekê pir keç hene azadiyê nas dikin di cilên kin de û her tişt bê ber devên wan bêjin bê ku guh bidin bê civat van tiştan erê dike yan na, ev hijmar Ji keçan azadiyê dibînin ku kengî Ji mal derkevin û kengî bi serbestî vegehin, lê ev nerîna Şaş Ji azadiyê re ne li cem keçan bi tenê ye, xort jî ne dîrî van şaşiya ne Ji ber ku pir ji xortan azadiyê nas dikin bi guhdana rengê xweyî Ji derve û zîncîra tîxin sitiwê xwe Ji dêvla ku guh bidin xwendina xwe û li kar bigerin . Demek ne ev azadiye ya ku millet canê xwe li ser dike, lê belê ev riya ketina rewîştîye û egerên wê ev in:

1- Zor destî û tunebûna yê ku millet îşkencê jê dibînin, tunebûn her tiştên ne baş dike.

2- Dûrbûn ji olê.

3- Bê karî ya ku egera sereke ye Ji şaştiyan re.

4- Bav yê ku zarokên xwe li ser nirxên girîng xwedî nake.

5- Ne çavdêrî li ser tilvizyon û enternê tê yê ku tiştên rind û ne rind belav dikin.

Ev eger û egerne din ciwanan bi ser şaştiyan de didin, çare ji wan re wek nimûne :

1- Rakirina zordestiyê li ser millet û bê karî û tunebûn nemîne.

2- Bav û dê berê zarokan bidin tiştên baş û wan hînî bingeha ola wan bikin.

3- çavdêriyeke xurt li ser tilvizyonên rût yê ku dîrî rewîştî civakê û yê ku bandora wan li ser ciwan heye û giringe malbat berê zarokan bidin ku enternê bi cî bînin bo karên zanîne û rewşenbîrî, ne karê ne zanîne û kirêt .

Ev tişt hemû alîkariyê di navbera dewletê de û malbatê de dixwaze, bo parastina xort û keçên me da ku nekevin newalên pašketinê û bizanî bin ku azadî azadiya nerîn û gotin û ramanê ye ne azadiya rengê Ji derve ye yê ku nizim bûna ramanê diyar dike. ■

طبقاته لا يرضى بالمهانة والذلّ ويدافع عن كرامته مهما كان الثمنُ غالياً"

تختلف الآراء حول الثورة السوريّة، حيثُ أنّ العدد الأكبر وصل إلى مرحلة اليأس من كثرة الأخذ والردّ غير المجدي حول اسقاط النظام أو إيجاد حلّ ما يكفل الحرّيّة للسوريين بعد هذه السنوات التي بدأت تطول، والمشادات الحاصلة في المحافل الدوليّة فيما يخصّ حال الثورة السوريّة واستمرار النظام السوريّ في متابعة غيّه وضلاله وبراميله دونما أيّ إحساسٍ من المجتمع الدوليّ وكأنّ السوريّ يعيش عملاً مسرحياً مخطّطاً له من قَبْل!!

يقولُ المواطن سعد محسن: "كنا متيقّنين أنّها ثورة حقيقيّة وهي كانت فعلاً كذلك ولكن النظام السوريّ كان بارعاً في تشتيتها والتخطيط المستمرّ في أن تكون ثورةً للفقر والقمع وليست ثورةً على الفقر والقمع، ثورةً لترسيخ مبدأ العنف بعد أن كانت ثورةً لترسيخ مبدأ التسامح واللاعنف، اعتقد أنّ النظام السوريّ نجح في ترسيخ مبدأ فشل الثورة!!

هذه آراء عيّنة من الناس والمواطنين البسطاء من مدينة القامشلي، والذين كانوا على أملٍ في غدٍ سوريّ مشرق خالٍ من العنف والدمار واشتداد الأزمات المختلفة التي لم تكن تخطرُ في بالٍ أيّ مخلوقٍ سوريّ، تُرى هل من ردودٍ لأسئلةٍ ومتطلّباتٍ هؤلاء المواطنين؟ هل من تفسيرٍ واضحٍ لما يجري الآن على عموم الأراضي السوريّة؟.. المواطنون في سوريا يأملون ذلك. ■



مخيم دوميز ومعاناة سكن الآجار

ليلى محمد

سيكون حديثنا حول اللاجئين الذين يعيشون في دوميز، معسكر فيه بيوت للآجار، فهذه البيوت كانت قاعات لجنود صدام حسين حيث قسمت إلى غرف بغرض تأجيرها للاجئين السوريين وهذه القاعات تعتبر شقق بالنسبة للأكواخ التي قام اللاجئون باصلاحها وترميمها بالنابليون والاشباب كي يستطيعوا العيش فيها هم وأولادهم، مجبرين إلى أن جاءت بعض المنظمات وتكفلت بترميم وتصليح تلك البيوت أو الأكواخ إن صح التعبير.

بعد أن عانى اللاجئون الكثير من العذاب لترميمها واصلاحها فيها فوضعوا بتركيب النوافذ والأبواب المصنوعة من الألمنيوم وتغيير وتمديد شبكات الصرف الصحي باكملها وحتى بعض البيوت كانت بدون حمامات، فقاموا بتركيب حمامات جاهزة وطلبت المنظمات من أصحاب البيوت ألا يرفعوا قيمة الآجار وعدم اخراجهم منها بعد التصليح والترميم، إلا أنهم بعد أن وجدوا البيوت قد تغيرت واصبحت أفضل من السابق دب الطمع في قلوبهم فمنهم من زاد اجرة البيت ومنهم من أخرجهم من البيوت، فهذا يعد ظلم واجحاف كبير بحق المستأجر.

فإلى أين سيذهبون؟ فلا يستطيعون الدخول الى المخيم لأن المنظمة قد ختمت فورمتهم بالختم الأحمر والفورمة هي بمثابة دفتر العائلة لكل لاجئ عليها صورة وأسماء أفراد العائلة جميعاً، فالذين يسكنون المخيم ختمهم أزرق أما خارج المخيم ختمهم احمر، فالسيد عادل تحدث لولات: (البيت الذي كان كوخاً وأصلحناه وأكملت المنظمة ترميم نواقصه، أخرجوني أنا

وزوجتي واولادي الصغار منه في برد الشتاء القارس فماذا سنفعل، أنا وهؤلاء الصغار في هذا البرد فوجدنا لنا بيتاً أخرحتى الماشية لا تعيش فيه، فأوينا إليه أنا وصغاري الى ان يفرجها الله). والسيدة ام عكيد تحدثت لولات: (إن صاحب البيت قد زود إجرته فأما أن ندفع وأما نخرج منه، وقالت رجالنا يعملون من الصباح الى المساء ويحاسبونهم بالدينار العراقي واصحاب البيوت يحاسبونا بالدولار الامريكي، فماذا سنفعل فقد قلت فرص العمل بعد هجوم داعش على المنطقة وكثر النازحين فيها). فاللاجئون يطالبون بتسوية أوضاعهم، فأما أن يدخلوهم إلى المخيم أو يقيموا لهم مخيم خاص بهم، فهل ياترى سيسمع نداؤهم وتتغير احوالهم؟. ■

Rewşa abûrî

Lawikê Romî

Ji piştî salên zor û zehmet ên ku li ser bajarê Serê Kaniyê derbas bûn, tevî hemû cûreyên kêmasiyê û tunebûna pêdiviyên serekî bazara bajêr hîn jî bêhn şikestî ye, nemaze di bazirganiyê de.

Hêjayî bibîr xistinê ye ku her bajarek baca xwe datîne li hemberî bargiraniya cengê û aloziya serbazî, Serê Kaniyê jî û ji destpêkê de hilgirtiye li ser mile xwe ev bare giran, diyare ku em derbasî sala sêyemîn bûne û hîn jî rewşa vî bajarî aram nebûye ji ber ku şerên li derdorê ji hêla rojavayê bajêr û başûr de jî hîn berdevarin, û ev jî dibe sedemek ji mayîna dudîlya bazirganî û tevaya xwelkên bajêr ku hêmenî li jiyana wan nebe mêhvan.

Ji hêlek din ve, roj bi roj li ser malêlên bajêr bêtir dibe hevoka "Ji bo firoştinê ye", mixabin ku piraniya ciwanan jî barkirin ji ber rewşa ne aram û şikestina hêviyên wan di berdevarbûna xwendê ji piştî wêranbûna piraniya zanîngehên Sûrya. Ev tişt jî hişt ku gelek malbat îdî bi yek carî ji vî warî bar bikin û îdî tenê bîranên xwe di buxceyan



xwe de rakin û bi rê bikevin.

Di heman babetê de, kirîn û firoştin jî di rewşek wêran de derbas dibe, tevî ne hedana buhaya Dolar li hemberî Leyreya Sûrî, ev tişt jî ziyane bêtir davêje li ser rojaneya welatiyan û barên wan girantir dike, ji piştî ev salên aloz û ziyandar, ku bajarê Serê Kaniyê têde ye, ma gelo ta kengî ewê ev baja were valakirin ji xwediyên xwe, dê kengî rewş ewê aram bibe û îdî ev şar jî wekî şarên din bi kesên xwe û malbatên xwe şad bibe û îdî bi hêmenî û aştî jiyana xwe bidomîne ? ■



من القمع بأي وسيلة كانت ومهما كانت الضريبة غالية ومنهم من ارتأى موقف المتفرج، ومنهم أيضاً من رفض الفكرة وخاصة بعد تسليح الثورة السورية عملاً بمفهوم السلمية، لكن ما النتيجة؟، انقسمت آراء المواطنين في مدينة القامشلي حول أهمية مفهوم الثورة وما جرى في سوريا خلال السنوات الأربع المنصرمة، منهم من أيد الثورة في البداية ومن ثم عَقب موقفه المؤيد ذاك بالرفض القاطع لشكل الثورة الحالي بعد الانقسام الحاصل وتعدد التيارات السياسية والعسكرية المتصارعة على كامل الأراضي السورية، يقول المواطن شيركو أحمة: "عند اندلاع الثورة في سوريا تيقنا الخلاص بعدما كنا نشاهده من مسار نجاح الثورات في البلدان العربية الأخرى ومدى التجاوب الدولي مع هكذا أنواع من الاحتجاجات على القمع السلطوي وكنا نقيس الوضع على مقاسنا في المنطقة الكردية وعلى سوريا بأكملها، سنوات من النضال السري كي نحصل على حق التحدث باللغة الكردية الأم التي مُنعنا منها لعقود طويلة، والنتيجة حالياً وبعد أن قَدّم الشعب السوري مئات الشهداء وآلاف المشردين الموزعين في كامل أصقاع الكرة الأرضية، حيث ما من دولة أوروبية أو عربية في العالم بأكمله إلا وتأوي سوريين هاربين من النيران المشتعلة على كامل الأراضي السورية، النتيجة هي فقر وأزمة اقتصادية وتيارات سياسية وعسكرية متصارعة على الأرض السورية، سوريا باتت جحيماً تحوي كل أنواع الخطايا في حين أن النظام المستبد لا زال ماضياً قُدماً باتجاه خراب الدولة وتحطيم التاريخ السوري على كل الصُّعد ومهما كانت النتيجة فالنظام ماضٍ في إسكات هذه الثورة."

بينما يقول المواطن دلبرين لقمان: "الثورة السورية كانت ضرورية للقضاء على القمع والاستبداد، فعلى الصعيد الكردي تمكنا نحن الكرد من الحصول على أبسط حقوقنا التي ناضل من أجلها الكرد طوال سنوات الظلام الماضية، الحقوق التي استشهد واعتُقل لأجلها خيرة شبابنا، وعلى الصعيد السوري بشكل عام تم التأكيد على أن الشعب السوري بكامل

كُل مواطن يفقه بالسياسة في القامشلي!!

جوان تر

"أليس" من الممكن إيجاد حلّ ما لهذه الأزمة التي نحن فيها الآن؟" يستفسر أحمد وهو بائع دخان على أحد أرصفة القامشلي، "أليس هناك من بوادر حلول من الممكن اتّباعها كي نصل إلى حل آمن لنا جميعاً، لقد تعبنا من المؤتمرات ومن المصطلحات الجديدة وما عاد بالإمكان السيطرة على الوضع، كل شيء نحو الدمار ولا أحد يحرك ساكناً، يتابع أحمد وهو مطأطأ الرأس وكأنّ هموم الدنيا كلها رابضة على أكتافه: المشكلة لا تكمن في الخراب، المشكلة تكمن فعلاً في انعدام الثقة بالسياسيين وعملهم الراهن، كيف من الممكن لسياسي يكذب ليلاً نهاراً واضحاً كالشمس أن يقود أمةً بأكملها؟! تلك هي حالتنا، اتركني وشأني لديّ عمل،" يغادرني أحمد وهو يحمل علب التبغ المهزبة و من ثمّ قبل أن يغادر يبوخ لي: "نحن نتاجر بالسموم كي نحصل على لقمة العيش يا أستاذ، نتاجر بدماء إخواننا كي نبقى على قيد الحياة، كما ترى بعينك، أتاجر بالنيكوتين وأنا الذي كنتُ عزيزاً في حياتي لا يقبل المهانة وكانت أقصى أحلامي أن أكمل دراستي، لكن الآن انتهى كل حلم ولم يعد هناك شيء غير تأمين لقمة العيش اليومية ومحاولة التأقلم مع الوضع الجديد"، يتركني وكأنّ مارداً يلاحقه.

منذ اندلاع الثورة في سوريا وإلى هذه اللحظة يبدو واضحاً للعيان الانقسام الحاصل بين أفراد الشعب السوري في مختلف المحافظات السورية وعلى الأخص في مدينة القامشلي بحكم كرديتها وخصوصية القضية التي فيها، منهم من اعتنق الثورة كخلاص من الاستبداد والقمع وضخى بروحه واستقراره النسبي حتى في أيام الظلام الماضية في سبيل النجاة

Hevpeyvînek bi nivîskar û lêkolînerê Kurd Xalid Cemîl Mihemed re.

Mihemed Zekî mihemed

Xalid Cemîl Mihemed, nivîskar û rewşenbîrê kurd ê niştimanperwer bi dehan gotar û lêkolîn di kovar û malperên kurdî de nivîsîn e, çar pirtûkên wî hene û bi wêrekî bervanî di ber ziman, çand û doza gelê xwe ya dadmend û rewa de kiriye, bûya serdam ku bi salan bi beryara asayîşî ya fermî ji mamostetiyê dûrketiye, lê vîna berdewamiya xebata rewşenbîrî û kurdperweriye di giyanê wî de, ne çilmsandiya û serî li li ber van kirayan neçimandiye.



Ev jî dîteneke kovara Welat bi mamoste Xalid re ye.

1- Binavê kovara Welat, bixêrhatina te dikiin, hêviya me ew ku bi kurtî jînenîgariya xwe ji xwênerên Welat re diyar biki?

Jînenîgariya min weke jînenîgariya her kurdekî Kurdistanê Sûryê ye. Êş, azar, hejarî û kar û xebata kurdayetî ji bo jiyaneke birûmet û xweş. Navê min XALID CEMÎL MIHEMED e. Li Taxa Hilêliyê, ya ser bi bajarê Qamişloyê, 30ê Adara 1968an, min çavên xwe

li ser jiyaneke vekirin. Min bawernameya Ziman û Wêjeya Erebî ji zanîngeha Helebê wergirt. Piştê bûme mamoste li dibistanên Qamişlo, lê bi fermaneke asayîşî ji rejîma Sûryê ez 7 sal û mehekê ji karê xwe hatim dîrxistin, piştê bi yek carê, rejîmê ez ji karê dîrxistin, weke guşarekê ji bo ku serê xwe jê re bitewînim, lê ev yek nebû û nabe jî. Çar pirtûkên min ên çapkirî hene. Herwiha guhdana min bi lêkolînen wêjeyî û zimanî bi zimanê kurdî û erebî heye. Ji dawiya sala 2012an ve li Tora Medyayî ya Rûdawê, kar dikim.

Rewşa tendûristî li bajarê Dirbêsiyê

Hûsên Al Sîno

Ji ber şoreşa ku li welatê Sûryê û şerê li wî welatî bi giştî û bi taybetî li Rojava yî Kûrdistanê ji ber rewşa xirab, piraniya textor û pijîşkan ji kûrdistanê koçberbûn, Sedema wê jî, ji ber ku alav û pêdiviyên jiyane li wê deverê pir kêmtir û yan jî mirov di kare bête tûnene, ji ber vê rewşê koçberî pir bûye û him jî pir bûna gurûpê terorîst mîna (Da'îş) û hin gurûpê din, Li bajarê Dirbêsiyê astengî û zehmetî ya rewşa tendûristî pirin mînak di destpêka şoreşê de pijîşk (500) Lîre yê sûrî ji nexweş werdigirt, lê niha bûye (700) Lîre ji ber vê yekê piraniya nexweş û xwedî nexweşiyên xirab ji wê deverê koçber bûne. Her wiha Dermanxane (Saydelî) jî pir bi vê rewşê zîyanên mezîn dibînin, ji ber bûhabûna derman û kêmtir dermana bi teybet dermanê êşa (Dil û Şekir) her wiha rewşa nexweşxaneyan jî di vê bandorê de ye ji ber kêmbûn û tûnebûnê, nexweş bi ber



nexweşxaneyên bajarê Qamişlo ve diçin yan jî bi ber welatê Tûrkiye û yan jî başûrê Kûrdistanê ve diçin, ji ber ku li bajarê Qamişlo jî tenê yek nexweşxane heye ew jî ya (Elnor) e û li Dirbêsiyê nexweşxana (Alalî) bi tena xwe ye û alavê pijîşkî pir lê kêmtir. Mirov di kare bête ku rewşa tendûristî di metirsiyê mezîn de ye, pêwistî heye ku berpirsyar li ser vê rewşê bi hûrbînî bi sekinin, Di dawî de hin ji pijîşk û xwedî dermanxaneyan (Seydelî) li deverê mane û alîkariya feqîr û hejara dîkin.



Nanê Kapekê Bixwin

Salar Salih

Dema ku şoreşa Sûriya di 15 ê meha avdarê sala 2011 an destpê bû, miletê sûrî bi hezaran daketin kolanan, di xwepêşindanan de doza azadiyê û rûmetê dikirin, lê qet ewan nizanîbûn ku dê rojek wê bê û Rêjîm ji wan re bibêje : De keremkin nanê kapekê bixwin.

Ev bûye demek nanê Hesekê hew tê xwarin, welatî gellek gazinan jê dikin, ev kêşê ji mehekê û şûnde li bajarê Hesekê derketiye, nanê Hesekê pir nexweş bûye, rengê nan bi ser reşbûnê ve çûye, hema tu dikarî bibêjî ku welatî li Hesekê nanê kapekê dixwin, ji ber ku rêjeya kapekê di arvan de bilind bûye û rêjeya genim tê de kêmbûye, îdî Desthilat û Rêveberiya Erzaqan ferman dane karmendên aş ku rêjeya kapekê di arvan de pir bikin, lewra nanê Hesekê hew tê xwarin.

Sedema sereke ji vê kêşeyê re ewe, veguheztina genim ji Cezîrê bo parêzgehên kenarî (Lazîqiyê û Tertûs), çiku ev bûye demek desthilata Sûrî genim bi berdeyamî ji parêzgeha Hesekê bi giştî bi turumbêlan vediguhêze bo herdû parêzgehên Lazîqiyê û Tertûs yên ku li rojavayê Sûriya li ser derya sipî ya naverast dikevin, genim bi rengekî ne normal tê veguheztin û bi tibabên mezin, turumbêlên mezin li pey hev di rêka bejayî re ya ku li jêr kontrola Rêxistina Da'îşê ya tîrorêst de ye genim bê rawestan vediguhêzin, lewra ev yek metirsiyekê mezin li nik welatîyên herêmê dafirînez eger tibaba genim kêmbibe, dê birçîbûn li herêma Cezîrê çê bibe.

Hin ji nişteciyên bajêr dibêjin ku hindik maye nanê ceh û garis bidin me, çimkî tibaba genim li parêzgeha Hesekê pir kêmbûye, îdî ji me re nanê kapekê tînin, ew kapeka ku ji ber herandina genim li aş dimîne cardî rêjeyekê bilind jê li nav arvan dixin û wî ardî dişînin nanpêjgehên bajêr da ku bikin nan û li welatîyan belav bikin, welatî naçar in ku vî nanî bikin û bixwin, lê ew ne razîne û gilî û gazinan dikin.

Ev pirsgirêk nû li parêzgeha Hesekê derketiye, bersivekê yekem di ber de ew desthilata rêjîma Sûriyê ye, ji ber ku qûtê xelkên parêzgehê ji genim vediguhêze bo parêzgehên kenarî, ev yek metirsiyekê mezin li ser xelkên vê herêmê çêdike, çiku bi kêmbûna tibaba genim metirsiya birçîbûnê çê dibe, nexasim ku nişteciyên vê parêzgehê di rewşek aborî aloz û dijwar de derbas dibin piştî buhabûna nîrxê dolarê Emrîkî li himberî Leyreya Sûrî û ev yek giraniyê mezin li ser welatîyan çê dibe.

Rûyekî din yê vê kêşeyê xuyanê dike, ew kesên ku nan li taxan difroşin welatîyan û bi navê (Mu'temed) tînin niyasîn, îdî ziyaneke mezin dighêje wan, ew dibêjin: Dema ku nanê reş ji me re tê û rêjeya kapekê tê de pir be, hin ji welatîyan wî nanî nakirin û diçin nanê buha ji nanpêjgehên taybet ji xwe re dikirin, lewra tibabek mezin ji nan di histê me de dimîne û ziyana diravî dighêje me.

Nişteciyên Hesekê niha dipirsin: Wê kengî nanekî taze ji me re bê? ■



2- Yekemîn pirtûka te (المجازفة في الكلام) e, gelo di wê demê de çi fişar û êrîş dermafê zimanê Kurdî de hebûn, ku giringiya bergirî û bervaniyê dixwest?.

Di salên dema desthilata Partiya El-Baas hin kesayetiyan alîgirên vê partiyê yan nêzîkî dezgehên asayîşî êrîşine giran li dijî Kurdan û zimanê kurdî dikirin. Min jî dît ku ji erkê min e, weke nivîskar û rewşenbîrêkî kurd, ku berevaniyê di ber zimanê kurdî de bikim, lewma min ew pirtûk bi zimanê erebî derxist, bi mebesta ku ew kesayetiyan dijminê zimanê kurdî bizanibin kurd bergiriyê, bi awayekî zainstî û rêbazî, di ber zimanê xwe de dikin. Ew pirtûk hejmarekê ji pirsên zimên li xwe digire, her ew di dema xwe de bû cihê balkêşiyê ji aliyê gellek xwendevanên erebî jî, ku nas kirin ew êrîşa li dijî zimanê kurdî şaş û çewt e.

3- Bê gumane ku helbestvanên Kurd ên kilasîk bi tevayî cihekî berz û bilind di wêjeya Kurdî girtine, çi cudawziya helbestvan Melayê Cizîrî ji yên din heye, ku bi firehî te li ser nivîsiya û bandora xwe li te kiriye?.

Nivîsandin û lêkolîna li ser Melayê Cizîrî vedigere wê niyaza ku pêwîst e gotara yekî ji payebilindtirîn û şarezatirîn helbestvanên kurd were diyarkirin. Giringiya hozanyariya Cizîrî tiştêkî balkêş û berçav e, lê ji ber zehmetiya gotara wî ya sûfîzmî û filozofî pêwîstiya wê bi şirove û lêkolînan heye. Guhdana bi helbestên Melayê Cizîrî rengek ji parastina wêje û kultura kurdî ye.

4- Ferhenga Kurdî di çi astê de ye, çi piroje ji bo amadekirina ferhengeke zanistî hene?.

Ferhenga kurdî, ji bilî çend nimûneyên hindik, bi piranî di lawazî û qelsiyê mezin de ye. Ferhengsazî li cem Kurdan nebûye huner, pîşesazî û zanist, lê ev kar, bi piranî di warê rêzkirin û listekirina peyvên de maye, di demekê de ku ferhengsazî li cem

miletên pêşketî derketiye asteke herî bilind û xurt. Sedema vê yekê jî ew e ku zimanê kurdî, peyva kurdî û ferhenga kurdî guhdaneke guncaw nabînin. Dezgehên van waran hejar, kêmbûn û qels in, herwiha rol nayê dan ku kesên pispor û şarezakarekê berhemdar bikin, ji ber ku pêwîstiya van karan bi piştgiriyeke darayî haye, ji bo çapkirin û belavkirina berhemman, lê ev pitgirî peyda nabe. Dahênerê van waran jî xwediyekî dilsoz ji xwera nabînin.

5- Di van çar salên dawî de, bizaveke baş di ber fêrkirina zimên de hate kirin, hin kovar û rojname ji hatin weşandin, tu suberoja zimên û çanda kurdî çawa dinirxîni?.

Bi nerîna min paşeroja zimanê kurdî baş e. Ez di vî warî de jî geşbîn im. Lê hêvî ew e ku di demeke kurt de, kêmasiyên fêrkirin û fêrbûna zimanê kurdî çareser bibin. Weke mînak, komîteyên amadekirina pirtûkên fêrkirinê ji kesên pispor dirust bibin, herwiha alîkariya pirtûka kurdî bibe, ji aliyê çapkirin û belavkirinê ve. Hez kirina zimanê kurdî di dilê xelkê de were çandin. Zimanê kurdî pêşketinê dibîne.

6- Te çi xelat wergirtine?.

Min xelatek ji Koma Xelat li ser pirtûka xwe ya Melayê Cizîrî wergit. Herwiha, berî çend salan, min ligel çend nivîskaran xelatek ji Partiya Yekîtiya Demokrat (El-Wehde) yê, bi amadebûna nemir Ismaîl Omer wergit. Min xelateke din jî ji Komeleya Celadet Bedirxan wergirtiye. Lê xelata herî mezin ew e ku pirtûkên min werin xwendin û rexnekirin.

7- Gotineke dawî ji xwênerê kovarê re?.

Baca mirovatî û kurdîtiyê giran e, lê ew baştirîn, xweştirîn û ciwantirîn bûyer e di jiyana Kurdan de, lewma ji erkê min e ez bi dilsozî xizmeta gel, civak û welatê xwe bikim. Tenê hêviya min ew e ku rewşenbîr û dahênerê kurd nemîne mijareke salveger û çilrojyan, lê bi saxî ew hest bi bihaya xwe bike. ■

çavên te

Stêrê ÇELO

ew çavên te
wek keleha dimdim in
tîrêjên evîneke nependî
jê dibrûsin...
herdu çavên te gemîne...
pêl û pingav û lehîne rûçikê te..
ji heyva çardehê
geş û şewşentire
nexşa qîştî û daylaniya
hemû keçan lê dicivin...
vî Yizdanî..
hemî kerasên xweşik û nazdar
bi ser bejn û bala te de
berdane û di çêkirina
gewdikên te de
tenê xwe westa kirê ye
ezê çawa ji wî Yizdanî hez
nekim....
û evîna teji nerêsim
wê çawa hezar ramûsanên
min
ji ling û destên te re nebin

gorî û qurban heye
yek ji wanjî bête
tewafa wa dêmên te
herdu lêvên te...
xoşxwan û lavêjin
daxwaz û lavlavin agir
û pêtên zerdeştîyan
di argûna evîna min de sar dîkin
ez vêga wa saw û razan
di awirên te de
bi hêsani nas dikim...
delalê û dizanim ku..
Kurdistanek azad, şarekî bê
sînor
û siwarekî bê vejer
tenê dikare di asoyên te de
bibe nêçîrvan..... ■

Tirbespî û pîşesaziyên destkarî..

Haydar Sifûk



W

eke tê zanîn di dîrok û çîrokên kurdî de gelek rengên pîşesaziyên destkarî hebûn û kurd di wan de jîr û zane bûn weke mînak ji wan pîşesaziyan: çêkirina berrikan,terzîtiya cil û bergan,dartaşî û hasingerî û nalbendî .. û herwiha hin rengên din jî yên ku destkarî tê de ya herî giring û bi bandor e. Di vî bajaerî de ev karên wisa hinek ji wan tune bûne û hinek hîn mane lê ne wek berî çar salan e,ku niha ketine derya xemên vî welaî ji buhabûnê,ji şer û koçkirinê,di vê raporê de taybetiyê didine karê dartaşiyê û terzîtiyê .. Wek gelek tiştan agirê rewşa welêt gihîşte dar û depan,dartaşî ne karekî hesan e,lê belê zanebûn pêwîst e di hemî asteyên her parçekî ku bi daran tê amedekirin,herwiha rengpîşeyên derveyî tî bi bîranî di wisa erk de ji bilî bîrkarî û endeziyê .. Gelek cureyên daran di vî karî de dihatin bikaranin wek Zan û Sundiyan ku dibûn pîştî xebata

dest û tiliyên dartaş: pencere,dergeh,mase û odayên xewê ji dûlaban heya bi textan .. Ev kar niha melûl e,ji ber giranbûna nixê daran û pêdiviyên çî parçeyî gerek wek boyax û bizmaran,lê hêjayî gotinê ye ku dartaşî karê yekî ji pêxemberê xwedê bû û ew jî " Nuh " e silav û nimêjen Yezdan lê bin .. Bêtir ji van pîşesaziyan ku mirov dikare bêje hîn baş li ser xwe ne ew " Terzîti " ye .. gelek dukanên terzîtiyê di bazara Tirbespiyê de belav dibin,lê belê gelek xwedî terzîxane yan jî dirûnkaran,ji bajêr barkirin û ewên mayî jî rastî êşkenceyan hatin wekî buhabûna ta û perçeyên caw yên ku tî bi bîranî û êşa giring ew e ya ku dibêje .. kêm û qutbûna elektrîkê ye . Di heman demê de ev pisgirêkên bûrî ne tenê li wir disekin,lê belê digihêjin nalbendiyê û hasingeriyê yan jî çî rengên jiyane hebe îdî dikevin rêça xerabiya rewşa deverên sûryê bi tevayî û ya kurdî bi taybetî. ■



Ronîkirina Kobaniyê bi saya enerjîya rojê

Şêrîn Temo

16

Ji 26 - 1 - 2015an de , dîroka derxistina hemû çeteyên DAÎŞ ji bajarê Kobaniyê û despêkirina vegera penaberên wî bajarî ji penagehên wan , piranî pêdiviyê jiyane li Kobaniyê tine bûn. Kobanî ew bajarê ku bi dirêjahiya du salan e di bin dorpêçkirinê de ye û rastî êrîşeke hov hat, dema vegera penaberên wê ti binemayê jiyane li hêviya wan tine bûn , ji lewra xelkê wê, berê, û ji bo ku jiyana zû li bajarê wan vegere li çarene demdêr ji her kêmasî û arîşeyê re geriyan.

Belê ; ti binemeyên jiyane li hêviya penaberên Kobaniyê yê vegeryayî welatê xwe tine bûn , ne kehrebe ku mal û kolanên ronî bike , ne av ku serî li malên bajêr yê tî bide , ne gaz ku agir di bin xwarinekê vêkeve , ne mazot û ne jî benzîn berdest bûn , û heger ku ew bihatana dîtin jî , nîrxên wan deh qatî nîrxên wan yê normal bûn. Mixabin rewş bajêr ji wê çaxê de gelekî nehatiye guhertin , ev arîşe tev , vegera penaberên Kobaniyê bo bajarê wan asteng dikin , rîya tek û tenha ku îro dikare Kobaniya ji vê rewşa aloz derxîne, dergehê Bakur (Tirkîyê) e , lê mixabin ew dergeh ta niha bi awakî fermî nehatiye vekirine , ji lewra tenê pareke biçûk ji pêdiviyên bajêr tê re tê , û parek din jî bi awakî qaçax ji wir (Tirkîyê) tê ,

ji lewra nîrxên keresteyan li Kobaniyê gelekî buha ne , ji ber ku piranî wan bi awakî qaçax tên.

Dimîne şîrê zarokan û pêdiviyên zarokan yê din , ku kirîna wan derveyî karîna beriyên gelek xwedan malên Kobaniyê yê xwedî zarok e , belê; dimîne ew yek ji sedemên gelek giring e yê venegera gelek penaberên Kobaniyê bo bajarê wan .

Rêxistina Heyva Sor ya Kurd li Kobaniyê her mehekê kodikek şîr (derdora 500 g) dide her zarokê berşîr li Kobaniyê , lê helbet kodikek şîr mehekê têra zarokê qet nake , ji lewra xwediyên wî neçar dibin ku temamî pîdiviya wî ji şîr , ji sûkê - hindê ku bi nîrxekî gelek buha tê firotin - wînin.

Lê ya ku îro li Kobaniyê bala mirov bêtir her tiştekî din dikşîne , bikaranîn enerjîya rojê ji alî şênîyan ve ji bo ronîkirina mal û mixazeyan e , û hem jî ev enerjî bikar tê , ji bo ronîkirina gelek kolanên bajarê Kobaniyê , helbet ev core enerjî wek çareyek demdêr tête bikaranîn ta ku di rojên bînan de kehrebeyê di rîya bikaranîna dînemoyên kehrebeyê yê mezin berdest dikin , di vê derberê de Desteya Enerjîyê li Kobaniyê dest bi suwarkirina 25 çirayên mezin yê ku li ser enerjîya rojê kar dikin , li kolanên bajêr yê serek kir , û kolanên Taxa Gomirkê (dergehê sînor) yekemîn kolan bûn li Kobaniyê ku hatin ronîkirin. Kobanî .. Kela Berxwedanê , weku li hember êrîşa mezintirîn rêxistinên terorî li ber xwe da , ewê li hember tengasî û tengaviyên jiyane jî li ber xwe bide. ■

فوضى

أنا هيتا سينو

أيتها الهارب
من مستنقعات الأزل
إلى آثار روعي المنحوتة بالوجع
توسد جراحي
و حقيبتك المحشوة بالأوراق
و رائحة الموت
احمل بقايا عمرك
و بعضاً من رائحتي
امتطي قطار الارصفة
و ارسم شارة الوداع
في ليالي غربتك الباردة
احرق أنفاسي لتدفئ
و لتعبق المدينة كلها
برائحة حزني
و في الصباح
انثر الرماد في حدائق جروحك
اركل ذكري
و تابع البحث عنك و عني
أنا المختبئة فيك
و أنت الهارب مني
هيا جرّب جرعة ضياع مؤقت

Gelo

Nûşîn Bêcirmanî

Gelo.....ez û tu,
ji kaniya dema bêdeng
hilatin....?
weke heyv û rojê..
gelo....
me dem bi xwe re anî
û ji gulên evîna stêran re
kire al...?
geloooo....
ez û tu,
em çilo gihane hev,
û em...
ji tevizînokên meya ,
di hinarkên rojê de
hilçenîn...
û me evîna jiyane
vexwar....
delala min...!!
buhar pesnê te ye
Reng.....
deng.....
û xilûxaviya hestên min
li ber arê di lêven te de,
kabok berdane (Erdê)!!! ■

9

Zimanê me, temeya bapîrên me ye

Izedîn Salih

Ziman endamekî bingehîne ji hebûna gelan re ye, Kurd jî yek ji gelên cîhanê xwedî welat, ziman û dîrok in

Herwiha zimanê Kurdî yek ji zimanên Hindo-ewropî ye, beşê zimanên Farisî ye ku bi binyad û kevnûna xwe tê naskirin, û elfabêyeke taybet bi zimanê Kurdî hebû lê êrîşên li pey hev ku ser Kurdistanê çêdibûn pirtûkên ziman şewitandin, çimkî artêşên Islamî nimêjgehên ola Zeredêştî ku dibe ola resen û kevnar ji Kurdistan re û pirtûka wan »Zendavesta» ya ku Zeredêşt bi xêzên Zarava «Mîdya» berî 2600 salî nivîsandibû şewitandin, lê mîr Celadet Bedirxan di Sala 1932an de elfabêyek zimanê Kurdî nû bi tîpên latînî damezirand û wê di kovara »Hawar»ê de weşand .

Gelê Kurd ji destpêka hebûna xwe de di bin nîrên bindestiyê de zorê dikişîne, û ji ber ku ziman hebûna dîrok, Çand, tore û hemû nirx û buhayên netewî ye, zimanê me dibû armanca êrîşên hovane ji aliyê desthilatên dagîrker ji Kurdistanê re, ku wan ramyarî birêve dibirin da ku zimanê me tune bikin, herwiha axaftin, dibistan, kovar û rojnameyên Kurdî qedexe dikirin, lê tevî hemû bizavên tunekirina zimanê me, hê jî ev ziman xwedî semyanekî

zengîn maye, ji ber ku bapîrên me ji berê de gavên rast û durust ji bo parastin û pêşxistina zimanê me davêjtin, herwiha nivîskar, rêzikvan û rewşenbîrên Kurd jî dibûn berbestek asê li hember ramyariyên tunekirina zimanê me .

Temeya bapîrên Kurdan her demê ji wan re rabûna wan bi parastina zimanê wan bû, lewre Bedirxan beg ji gelê xwe re dibêje : «Ez ji we dixwazim ku hûn zarokên xwe fêrî zimanê bapîrên xwe bikin, û yê bi Kurdî ne axive ew ne lawê min e û ez xwe ji wî bêguneh dikim». Helbestvanê Kurd yê navdar Ceger Xwîn jî dibêje :»Eger ez bi zimanê xelkê binivîsim wê zimanê min biçilmise û bemire, lê çaxa bi zimanê xwe binivîsim wê xelk hewl bidin bi zimanê min bixwînin û binivîsin». Ji aliyekî din jî rêzikvanê navdar Dr. Nûredîn Zaza ji Kurdistan re dibêje : »Gelî Kurdistan, eger hûn naxwazin ji hev tarûmar û winda nebin, berî her tiştî bi zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin», di dawiyê de Pêwîste em bizanin ku em bi kêr xwe neyên û ziman, Çand, û dîroka xwe ne parêzin kes bi kêrê me ewê neye ■



karî bike, ji ber ku rêkên me ne hazir in û ajovanên me jî bo gaveke wisa nehatina amadekirin"

Ji alî din ve, karêgêra şaxa polîsên tirafîkê ya jinan, şêrîn Qedîb El-ban dibîne ku jin dikare di hemî mofirkên jîyanê de, li kêlek mêran bisekine, û ew ji bo xwe şervana kurd Arîn Mêrkan weke mînakekê dide naskirin.

Di vê warî Şêrîn dibêje: " Di heştê meha Avdarê de, bi boneya cejna jinê ya cîhanî beşê polîsa tirafîkê yê jinê hate avakirin, ev roj ji ber xwe ve nehatiye lê bi saya qurbaniya Arîn mêrkan derketiye holê".

Hajêyî gotinê ye ku ezmûna jina kurd di warê çekdariyê de vedigere destpêka salên heştê, ango di wê demê de partiya kakerên kurdistanê li dijî hikûmeta turkiyê dest bi şer kir û jina kurd jî di wî şerî bi awyêkî berçav heya niha beşdar e. ■

Li Efrînê Polîsên jin û tewşiya jiyane

Bîrwerê Gêncê



ev gav bi dilferehî û kêfxweşî pêşwazîkirin û hinên din jî dîtî ku ev tiştêkî nû ye, lê tevî vê jî wê karê xwe berdewam kir û qerebalixa li nava bajarê Efrînê bi rêkûpêk dikir.


Kewser diyar dîke" karê min ji se'et heştê dibehê heya sisiyan piştî nîvro ye û di roja yekê, gava ku ez daketim kolanê, ez gelek kêfxweş bûn, ji ber ku cara yekê jin dadikevin kolanê û vî karî dikin hinek pîrsgirêk derdikevin pêşiya me, loma hincaran ez neçar dibim û ajovana ceza dikim û hin caran jî ez çavên xwe li wan dadimrînim".

Li hemberî vê yekê, ve yeka han, li ser hevalê Kewserê Evdo jî tiştêkî nû bû, ango ew li heman xala kontrolê alîkariya wê dîke û tevî ku wî tevîbûna jinan di nava karê tirafîkê de, wek tiştêkî erênî da naskirin, lê bi rengekî din li wê mijarê dinêre ango Evdo dibêje:"

Ev gaveke zor baş e, ku hevalê jin tevî karê me bibin, lê hîn dem zû ye ku jin li kolanê vî

Rewşa xwendekaran di şoreşê de.

Gulal Liyanî



Nîrên zor û zehmet û qeyrana sûryê bi giştî tê re derbas dibe, bandoreke neynî li jîwar û civakê kiriye, bitaybetî li nifşê ciwanan, ku paşeroja wan hatiye bînpêkirin, nemaze ji aliyê xwendinê ve, hejmareke mezin ji xwendekarên zankoyê xwendina xwe rawestandine, ji encama ne aramiyê û pisrgirêka abûrî ya dijwar.

Ji loma rêjeyke mezin ji van ciwanan koçberî dervî welat bûn, beşê ku li welêt jî mane, bê vîna xwe dûrî xwendinê mane.

Mîna Yeman, ew xwendekarê sala siyeme li zankoya Heskê beşê bazrganî û aburî, wî dest bi karê Terzîtiyê kir dema ku dît çare nemaye ku xwendina xwe berdewam bike. Xwendekar Yasir Mihemed

xwendekarê beşê wêjeya Englizî ye di zankoya Şamê de, ew niha li başûrê Kurdistanê dijî, di kampaniyê avakirinê de karmend e, ji kovara Welat re axivî: Jiber stmekaraya desthilata sûryê di zankoyê de û girtina xwendekaran ji aliyê desthilatê, ez neçar bûm ji Şamê birevim û bibime karmendê avakirinê.

Lê keçên xwendekar bêtir ziyar gihşte xwendina wan, ji ber ku ne aramiyê xwe li ser sûryê bi tevayî vegirtiye malbetên wan nikarîbûn wan bi şîn in zankoyê.

Herwiha beşê ji xwendekaran tevî hêzin leşkerî bûn çî Asayiş yan YPG ew ji dorî xwendinê ketin. Bi sedan ciwan dûrî xwendinê ketin bê ku kes alîkariya wan bike.

ma gelo ev gunhê kê ye ku nifşek xwendekaran paşeroja wan bînpê dibe? ■

14 **D**i bin tîrêjên rojê de, di nava toz û qerebalixê de, polîsa bi navê Kewser liser çaterêyeke navenda bajarê Efrînê rawestiye, li şûna gerdana zêrîn pîkek xistiya stûyê xwe û telefoneke taybet bi polîsan xistiye ber nava xwe, ango ew liv û tevgera tîrembêlan bi rêkûpêk dîke.

Roja 8 Avdarê, ango weke roja cejna jinê ya cîhanî tê naskirin, di jiyana Kewsera bîst û pênc salî de, rojê çarenûsî bû, ango di wê rojê de ewê weke polîseke tirafîkê dest bi karê xwe kir.

Kewser dibêje:" di dema min bihîst ku hevalên min tevî şaxa polîsên hatûçûnê dibin de, wê hingê ji ber cefaya karûbarên mal, mîna çekirina xwarinê û lêmiqatebûna mal

û zarokan, ez gelek diwestiyam, her gav eynî rotîn li ser piştê rojê min bû, lê gava ku ez derbasî şaxa tirafîkê bûm û min li kolanê dest bi karê xwe kir, min hest kir ku jiyana min guherî û her roj ez pê dihesim, ez tiştên mezin û nû bidestdixim".

Ketina jinê nav şaxa polîsên tirafîkê de bi xwe weke astengiyeke mezin dihate naskirin û li gor ku Kewser dibêje, gelek



Paqijî... Cureyekî dine ji şoreşê ye

Rodî Hemê

Piştî şoreşa sûryê li darket, bi hezaran hêzên leşkerî hatin avakirin, herwiha gelek saziyên civakî hatin damezrandin û her beşek li ser xêzikekê meşiya, lewra raghandinê ronahiya xwe avêt ser hemiyan û bi hezarê gotar û raporên li ser wan hatin nivîsandin, di heman demê de gelek hevdiştin, hevpeyîn û guftûgo bi kesên karkir û berpirisyar hatin kirin, lê dema ku armanca şoreşê guhertin û paqijkirin bû diwate ku paqijkerên roj ava şoreşeke bêhempa dajon, di vî warî de birêz Selîm Hisên paqijkere di şaredariya bajarê Qamişlo de wiha axivî: Weke ku paqijkirina welat ji terorê giringtirin armancên şoreşa sûryê ye di heman demê de paqijkirina bajarên ji gemarê pir girînge, em jî şoreşekê dajon dema em welatiyan ji nexweşiya diparêzin, em karekî sivîl dikin, ji dema ku em kolanan paqij dikin, bê guman paqijî cureyekî din ji şoreşê ye.

Birêz Ebdella murad, ji sala 2000an de paqijkere, diyar kir ku tevî ku mûçeyê me hindike û bi kotekî em meha xwe bi dawî dikin, lê çênabe ku ez dev ji karê xwe biqerim û wiha got: Min dikarîbû ez biçim Turkî yan başûrê Kurdistanê û

bê guman bi hezarê karan hene ku ez dikarim bikim, lê min dît ku pêwîstiya paqijkirina bajarê min li pêşiya hemû bihaneyan xist, ev ne biryara min tenê ye, lê ev biryara hemû hevkarên min e.

Dema ku asta têgihştinê ne bilind be, dibe sedema yekser ji paşxistina nerîna perçeyek ji civakê, ku van karkirên ku tenderustiya xwe dikin qurbana civakê kêr dibînin, birêz Mustefa Mihemed Elî rêberekî civakiye li ser vê mijarê baş axivî û got: Dema ku civak bighê bawerîya ku paqijker navê wî ne "Zebale" wê gavê wê bizanibe ku ew kesê ku kefa destê xwe bi kar tîne ta ber deriyan paqij bike, wê gavê em dikarin bibêjin ku şoreşê civaka me bi pêş xist.

Ne bi tenê civaknasan helwestek erênî dan, lê hinek welatî jî di vê bîrûbaweriyê de ne, Siwar Delîl welatiyek ji taxa Kornîş e got: Eger ku mirov rola paqijkeran di pêşxistina civakê de zaniba, ewê dev ji hemû karan biqerîya û biba paqijkar.

Hêjaye gotinê ye, dema ku piraniya saziyên hikûmeta sûryê li cizîrê hatin rawestan, şaredarî jî wan saziyên ku endamên wê ta nuha kêmasî nexistin karê xwede. ■

Nifşên paşerojê ber bi mirinê ve diçe

Fener ehmed

Sala xwendinê li sûryê dike bi dawî dibe, xwendekar dest bi haziriyên xwe ji bo ezmûnan dikin, tevî rewşa lawaz ya ku xwendina sûryê têre derbas dibe, ji sedema rewşa tevahî ya ne baş û ya ewlehî bi teybetî.

Mihemed şagêrtek di pola sisyê de ya, pir keyf xweş e ku wê havînî dibistan werin rawestandin, wê bêtir bikare ji xwe re bi leyze, û dema ku me ji pirsî ka amedeyê wî ji ezmûnan re hene got: Me gelek ders di dibistanê de ne birin e.

Serhat ji şagertê pola neha ye, ew li gelek korsên taybet beşdar bûye, ji sedema ne başiya xwendinê di dibistanan de, û kêr guhdanê bi şagirtan û xwendina wan, ew dibêje: Gelek hevalên min nema dihatin dibistanê, tenê diçûn korsên taybet. Serhat ji me re anî zimên ku rewşa wî ya derûnî tevî heve û tirs li cem wî çê dibe bi sedema tevîlîheviya ku di ezmûnan de çê dibe û mamosteyên çavdêriya ezmûnan dikin, bi erkê

xwe ranabin, ji loma serberdayitî çê dibe û rê li ber suxtekariyê vedibe, îdî nema şagirtê zîrek ji yê nezîrek tê naskirin.

Ji aliyekî dive derbarî rewşa xwendekarên zanîngehan, ew jî di rewşeke xerab dene, ku rêjeyeke mezin ji xwendekarên dev zanîngehê berdane ji ber rewşa ne ewlehî di sûryê de, tenê hin xwendekarên Şama peytext û lazîqiyê diçin hazir dibin.

Salar xwendekarekî zanîngeha Helebê ye, sala 4 a ji endeziyariya mîkanîk dixwîne lê ew nikare here Helebê, loma ew li Heseke ezmûnên xwe dike, ev sê sal in, her sal li hêviya biryara zanîngeha Heseke dimênin ta bihêle ew û her kesê weke wî ezmûnên xwe li Heseke bikin, ev pirsgrêka herî mezine ji wan re û wan her sal di metirsiyê de hile, û bandorek nebaş li xwendina wan dike.

Piştî ku bawernameya sûryê, û rewşa xwendina wê giha bû asteke gelek balkêş li seranserî cîhanê û rojhilata navîn û bi pêşketinê hatibû nasîn, niha di astek gelek lawaz re dirbas dibe û paş dikeve, herweha xwendekarên wê jî paş dikevin, nemaze ku pêşketina welatan bi zanebûna kesên wê ye. ■

